KURTEÇÎROK

HEVALÎNIYA BALINDEYAN

Nefîsa Îsmaîl

Ez bi hemû giyanê xwe û pir bi hêvî û omêd lê geriyam, demê min hizir kirî ku min dît, min xwe li serê burceke gelekî bilind dît. Ewir gelek nêzîkî min bûn. Hindek caran komên balindeyan jî min didîtin pêk ve difirîn; Diyar e ew jî gehiştîne ew tiştê lê digeriyan. Azadî û xweşiya min û wan, nêzîk hevdu ye. Ewrên sipî weku çiyayên befrîn di bin me de xweşiya me zêdetir dikir û dibûne berkeke raêxistî, baweriya bi wê çendeya em gehiştînê, qayîm tir dikir.

Ji nişkekê ve dengekê bi hêz, giyanê min û wan ji wê xweşiyê hişyar kir, berika befrîn di bin me ve derzên reş lê belav bûn. Baweriya me di gel de dibû leylan. Min li wan nêrî, li wa diran nema bûn. Min xwe bi tinê didît. Hêvî û omêd di gel berika befrîn dihatin xwarê û bi tinê leşekê vala li wê bilindahiyê di gel tirsê û bê omêdiyê dima.